

İsmaîl Bêşîkçî

“Ji bo ku hemû nirxên Kurdan yên neteweyî winda nebin, divê netewep-erwer bin”.

...» 3

“Serkirdayetiya siyasî ya kurd li Başûrê Kurdistanê heya niha pir jîrane bi rewşa niha ya Îraqê re danûstan-din kiriye”.

...» 6



Ebdulla Hicab

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de


AGIRÎ

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (233) 06-07-2014 Buha (150) Tûmen

Rêzgirtin ji yad û bîra Dr. Qasimlo

Hêdî-hêdî em nêzîkî 22’ê Pûşperê selvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî dibin.


Lewra hewce ye ku her takekî Kurd li gorî dawakariyên PDKÎ rêz û hurmetê ji ked û tekoşîna bi salan ya Dr. Qasimlo ji bo netewa kurd bigre.




Îran di Îraqê de li pey çi digere? ...» 5



Roja cîhanî ya piştevanî ji goriyên îşkencê ...» 7



Karesata kîmyabarana bajarê Serdeştê ...» 7



Roja cîhanî ya Bêwejinan û awrûyek kurt ...» 9

Se’dûn Şerîfî ji bo Agirî bas ji jiyan û serpêhatiyên ser-dema pêşmergatiya xwe dike ...» 8



Dîplomasiya Dr. Qasimlo pirsa Kurd cîhanî kir



Kurdistanmedia: Rêûresma 22’ê Pûşperê, 25’emîn salvgera şehîdkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî li Viyenê, bi destê dîplomat – terorîstên rejîma Îranê, li bajarê Silêmaniyê de birêve çû.

Ew rêûresm roja Şemiyê 14.04.1393’an, (05.07.2014) bi amadebûna endamên rêberiyê yên PDKÎ, endaman, û hejmarek ji mêhvanan di hola rewşenbîriya bajarê Silêmaniyê de birêve çû.

Ew rêûresm bi xwendina sirûda neteweyî ya “Ey Reqîb” û ragirtina deqeyekê bêdengî, bona rêzgirtina ji riha pak ya şehîdên riya rizgariya Kurdistanê dest pê kir.

Piştre Mihemednezîf Qadirî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ bi vê boneyê, çend gotinek pêşkêş kirin. Navbirî di axavtina xwe de tevî îşarekirina bi hizra

Dom R: 2

Sergotar

Dewleta Kurdistanê

Şehab Xalidî

Rejîmên zal û deshilatdar bi ser Kurdistanê de, û herwisa hevbîrên wan bi salan bû ku digotin Kurd hêjayî vê nînin ku bibin dewlet.

Lê Kurdan li her perçeyeke Kurdistanê de bi hêvî û moraleke bi hêz ve, şoreş û xebat kirin û li jêr siya vê xebatê, her perçeyekê kariye hinek qonaxên gihîştin bi azadiyê bibire.

Di nava van perçeyan de, li Kurdistana Başûr Kurdan kariye xaka xwe li jêr lepê dîktatoriyetê rizgar bikin, û deshilata xwe ya otonom ava bikin. Wan karî biselimînin ku Kurd dikarin ji gellek welatên derdorê demokrattir û jîrtir bin ji bo deshilatdariyê.

Bi xweşî ve îro rojê ew gihîştin qonaxekê, ku bas ji diyarîkirina rojekê bo referandoma serxwebûna Kurdistanê dikin.

Lê rejîma Îranê yek ji wan neyaran e ku bi gellek sedeman ve li dijî dewletbûna Kurdan e. Lewra ragehandiye ku dibe Kurd şerê DAÎŞ bikin, û pişta Malik bigrin û yekparçeyiya xaka Îraqê biparêzin.

Lê bi xweşî ve serokên Kurdan di vê para Kurdistanê de, heya niha bi başî çûne pêş, û nexwestine ku bi hêceta parastina yekparçeyiya ku tenê bi nav maye, di şerekî de beşdariyê bikin ku ne şerê wan e.

Wan ragehandiye ku yekparçeyiya bi zorî, di dawiyê de her digihîje veqetiyanê. Lewra ew bi mafê xwe dizanin ku ji niha şûnde xwe nexapînin û tenê û tenê li benda biryara xelkê xwe bin, ne eva ku bi dilê Îranê, û hinek welatên Erebî, û dijberên din kar bikin.

Belê Kurd hekî bi vî awayî herin pêş û berjewendiyên neteweyî bikin bingeha kar û xebata xwe, û yekîtiya di navbera xwe de biparêzin, ew ê bikarin bibin xwedî dewlet, û xewna bi salan ya Kurdan di vê para kurdistanê de, wê ser bigre, û bê hêvîtî wê bibe para neyarên Kurdan û yek ji wan Îran.

Simînarek derheq bi 25'mîn salvegera Şehîdketina Dr. Qasimlo û hevalên wî, li zanîngeha Koyê birêve çû





Sê rêxistinên Lawan, Jinan û Xwendekar ên Demokrat a Kurdistana Îranê, roja Sêşemiyê Berwarê 24.06.2014(3'ê Pûşperê) bi boneya 25'min salvegera terora Dr. Qasimo û hewalên wî bi destê dîplomat terorîstên Komara Îslamî li ser mîzê danûstanê û, herweha liser exlaq û kesatîiya vê rêberê netewî, simînarek bo Pro. Xidir Mesûm serokê berê yê zanîngeha Koyê û herweha Dr. Mîro Eliya endamê Deftera Siyasî a PDKÎ pêk anîn.

Simînar di despêkê de bi sirûda netewî ya Ey Reqîb û rêzgirtin ji canê şehîdên Kurd û Kurdistanê dest pê bû û pişt re di beşa yekem a simînarê de, Pr. Xidir Mesûm çend gotinek li ser exlaq û kesatiya Dr.Qasimlo di dema şoreşê de pêşkêşî beşdaran kir û têde pêdagirî liser rêxistin û teşkîlat û pirensîpên Dr. Qasimlo û PDKÎ di dema xebata çekdarî de kir.

Navbirî di beşek din a gotinên xwe de şehîdkirina Dr.Qasimlo û nemana kesatiya wî, bi xisarek mezin bo tevgera Kurd da zanîn.

Di beşa din a simînarê de Dr.Mîro Eliyar endamê Deftera Siyasî a PDKÎ ,piştî pêşkêkirina basekê li ser kesatiya rêberê mezin Dr.Qasimlo, ev yek da zanîn ku dewleta Otrîşê li hember vê cînayeta dije mirovê bê helwêst ma û eva jî lewaziya deshilata Otrîşê li hember rejîma Komara Îslamî selimand.

Dr. Mîro herweha bas ji vê yekê kir ku Dr.Qasimlo ligorî edet û yasayên siyasî bona gotûbêj derheq bi pirsa Kurd Tevî rejîma Îranê cû civînê, lê ji aliyê dîplomat terorîstêm Komara Îslamî ve liser mîzê danûstanan hate terorkirin û dewleta Otrîşê bi bê tu dadgahak û tu pirsyarek, terorîst radesî Komara Îslamî kirin.

Birêz Eliyar di gotinên xwe de bas ji vê yekê kir ku Komara Îslamî bi awayek eşkere ragehandiye ku, hekî dewleta Viyenê pêdeçûnê bi terora Şehîd Qasimlo de bike, wê canê hemwelatiyên Otrîşî li Îranê bikeve metirsiyê û ewa jî bona lewazî û bêdeshilatiya karbidestên dewleta Otrîşê vegerand.

Di beşa dawiya simînarê de dêkyomêntarek li ser jiyana Dr. Qasimlo û bandora wî li ser tevgera rizgarîxwaziya Kurd hat nîşandan.

Doma R: 1

pêşkevtinxwazane û pêgeha bilind û xwedî buha ya Dr. Qasimlo di asta navneteweyî, Îran û Kurdistanê ragehand: "Dr. Qasimlo her di destpêka serkevtina şoreşa neteweyên Îranê de, armanca pîlanên rejîmê bû, û Xomêynî bi eşkereyî ragehandibû ku nekariye wî bixe dava pîlanên xwe de, û nerehetiya xwe di vê derheqê de eşkere kiribû".

Navbirî herwisa ragehand: "Hemû hewl û tekoşîna Dr. Qasimlo ji bo derbazkirina pirsa Kurd ji sînorên destçêkirî ên rejîmên dagîrkar û navneteweyîkirina vê pirsê bû".

Piştre fîlmeke dekomêntarî li ser kesayetiya şehîd Dr. Qasimlo bi pirojoktorê hate nîşandan, û piştî



wê, sirûdeke şoreşgerî ji aliyê korra muzîka PDKÎ ve hate xwendin.

Di beşeke din de, peyamên partî û aliyên siyasî yên beşdarî vê rêûresmê hatin xwendin, û helbestek jî ji aliyê Nahîd Husênî ve hate pêşkêşkirin.

Berfirehiya axavtinên birêz Mihemednezîf Qadirî di hejmara bihê ya Agirî de wê bê weşandin.

Îsmaîl Bêşikçî bîrmendê naskirî ê Tirk, ku weke berevankarê mafê Kurdan hatiye naskirin, vê carê jî serdana Herêma Kurdistanê kir. TISHK TV jî ji vê derfetê mifah wergirt û hevpeyvînek di gel wî pêk anî ku me jî bi hewce zanî ku beşek ji vê hevpeyvînê di vê hejmara Agirî de bilav bikin.

H: Selîm Zencîrî



Pirs: Mamosta cinabê te Tirk î, û herwisa mamostayê zanîngehê yî, çawa bû yan jî çima te xwe li pirsa pirr ji kêşe ya kurd da?

Bersiv: Di 27ê Gulana 1960î de, li Tirkiyê derbeyeke leşkerî çê bû. Piştî wê derbeyê di çapemeniya Tirkiyê û zanîngehan de, gellek babetên cuda cuda hatin munaqeşekirin.

Bo nimûne, pirsa hebûna cot meclîsan, azadiya çapemeniyê, otonomiya zanîngehê, reforma axê û babetên weha dihatin munaqeşekirinê. Yek ji wan jî, Tirkbûna Kurdan bû, babetekî weha jî hebû. Anku neteweyek bi navê Kurd nîne, hemû kes Tirk in, zimanek bi navê Kurdî nîne, zimanê ku bi Kurdî dihête binavkirin, zaravayek ji zimanê Tirkî ye.

Tiştên bi vî awayî dihatin axaftin û gengeşekirin. Ez hingê li Enqerê xwendekar bûm. Min li zanîngehê di beşa zanistên siyasî de dixwand. Wê demê, di nava xwendinê de programek bi navê stajê hebû. Di çarçoveya wê programê de ez çûbûm Elezîzê(Xarpêt).

Li wê derê, li cem walî û qeymeqaman ûsûlên îdarî fêr dibûn, wek curek stajên qeymeqamiyê bû. Bo nimûne li Elezîzê, navçeyên Karakoçanê, Kebanê, Palûyê, Madenê, Erganiyê, di nava gundiyan de nakokiyên ax û zeviyan çêdibû.

Nakokiyên milkiyetê çê dibûn. Qaymeqaman ji bo safîkirina wan nakokiyan ji aliyê îdarî ve diçûne wan gundan. Ez jî di gel wan diçûm. Gava diçûme her gundekê ji wan bo nimûne li Kebanê,li wir kesên tercuman hebûn di navbeyna qaymeqam û gundiyan de.

Gotinên ku qaymaqam digot bo gundiyan tercume dikir û gotinên gundiyan jî bo qaymaqam wergêran dikir. Di navbeynê de tercumanek hebû. Weha nîşan dida ku zimanek bi navê Kurdî heye, neteweyek bi navê Kurd heye.

Wê demê her kesî li Enqerê digot, zimanek bi navê Kurdî nîne, miletek bi navê Kurd nîne, ev bûn tiştên ku di çapemeniya Tirkan de behs jê dikirin.

Pirs: Gelo karê te yê han alîgirî yan heskirina taybetî bo kurdan e yan armanceke mirovdostî û xizmet bi mirovahiyê ye?

Bersiv: Niha weha ye, hebûnek heye, li Enqerê dihate gotin ku Kurd nînin, zimanek jî bi navê Kurdî nîne. Li Kebanê, li Elezîzê, tercumanek di navbeyna qaymeqam û gundiyan de hebû. Demek zimanek bi navê Kurdî heye, ji bo wê ye di navbeynê de tercumanek heye.

Ya girîng ev e mirov vê fam bike, têbigehe. Bi rêbazên zanistî hewl bide vê meselê bizane, têbigehe, divê wisa binirxînin.

Yanî piştî wê qonaxê, em bêjin di sala 1961an de, piştî vê qonaxê dixwînî, vê fam bikî, têbigehî. Piştî vê pêvajoyê dibînî ku derbarê Kurdan de hinek qedexe hene.

Pirs: Birêz Bêşikçî em dibînin ku pirsa Kurd pirsek dîrokî û siyasî bûye, çima heya niha nebûye dewlet? Bi baweriya te kîjan fakterên dereke an jî navxweyî sedema vê yekê bûne?

Bersiv: Herdu jî bi bandor in. Faktorên derekî jî bi bandor in, yên navxweyî jî hene. Dabeşkirin û parçebûna Kurdistanê di salên 1920an de pêvajoyek bû di nav Neteweyên Yekbûyî de pêk hat.

Di wê serdemê de ku heqê diyarîkirina mafê çarenûs serdemek bû ku gellek dihate ber bas. Bo nimûne, li Yekîtiya Sovyetê, Lenîn, Stalîn, Trotiskî gellek behsa wê dikirin. Li Dewletên Yekbûyî Amerîka Serok Wîlson gellek behsa vê babetê dikir.

Di vê serdemê de Kurdistan hate parçekirin û lêkvekirin. Du hizrê mezin yên wê serdemê yanî ji aliyekî Berîtaniya û Feranse hebûn, û em behsa salên 1920î dikin, û du dewletên kevn yên Rojhilata Navîn, dewleta Împaratoriya Osmaniyan, berdewamiya împaratoriya Osmaniyan wate Komara Tirkiyê, û Împaratoriya Îranê ku berdewamiya împaratoriya Îranê jî Şahenşahiya Îrana nû bû.

Van her çar hêzan pêkve bi şiklekî organîze, dest bi ser Kurd û Kurdistanê de girt. Ji bo ku Kurd û Kurdistanê ji nav bibin, pêvajoyek bi vî rengî dane destpêkirin.

Helbet, li vê derê faktorên derekî girîng in. Berîtaniya, hêza duyemîn ya wê serdemê bû, lê belê divê em weha jî hizr bikin, salên 1920î parçebûna Kurdistanê ya sêyemîn e.

Yanî cara sêyemîn e Kurdistan careke dî hate parçekirin. Cara yekemîn, di çaryekê ewil ya sedsala 16an de Kurdistan di nava împaratoriya Osmanî û ya împaratoriya Îranê de hate parçekirin.

Cara duyemîn, di çaryekê sedsala 19an de di dema şerên navbeyna Rûsan û Îranê de beşên bakûra Kurdistanê ketin bin rêvebiriya Împaratoriya Rûsan de, li Qefqasê dirustbûna Kurdistanekê.

Ev dabeşbûna sêyemîn ya di 1920î de, dabeşbûn û parvekirina sêyemîn e. Ev tê çi wateyê? Di rastî de, kêmasiya Kurdan heye.

Hêzên neyar, hêzên dijminên Kurdan ji vê kêmasiya Kurdan qazancê werdigrin, wan parçe dikin. Ji ber vê divê bi vê kêmasiya xwe bihesin, vê kêmasiyê bibînin û ji vê xilas

bibin, ev girîng e.

Pirs: Bi baweriya cenabê te pêşmerge kê ye? Çawa pêşmerge pênase dikî?

Bersiv: pêşmerge, welatperwerên Kurd in. Kesên xebatê ji bo azadiya welatê xwe dikin. Mafên Kurdan, azadiya Kurdan hatine zewtkirin, li her cihekî bakûr, başûr, rojhilat, rojava, maf û azadiyên Kurdan dest bi ser de hatine girtin.

Pêşmerge, ji bo wergirtina wan mafên ku hatine zewtkirin, ji bo baştir ziman û kulturên xwe sax bikin, pêşmerge ew kes in ku xebatê ji bo wan dikin.

Pirs : Niha Kurd di piraniya parên Kurdistanê de ber bi pêşve çûne, li Başûr pêkhateyek hinek fermî heye, li Rojava serbarê kêmasiyên xwe deshilatek xweciyî heye û herweha li Bakûr piroseya aşîtiyê derketiye holê, divê navberê de tenê Kurdistana Rojhilat e ku di bin destê rejîma Komara Îslamî de tê çevisandin, nêrîna te liser Kurdên Rojhilat û rejîma Komara Îslamî çî ye?

Bersiv: Başûra Kurdistanê tê zanîn, bakûra Kurdistanê tê zanîn, rojava jî di van salên dawiyê de, tê zanîn, lê rojhilata Kurdistanê ji aliyê raya giştî ya dinyayê ve zêde nayê zanîn. Ji aliyê raya giştî ya Kurd ve jî zêde nayê zanîn. Gelo sedemên vê çi dibin? Cara ewil desthilatdariya rejîma Îranê desthilateke tund e. Li ser çapemeniyê givaşên tund hene, ji bo ku tiştên li Îranê diqewimin, di medyayê de cih negirin.

Wek mînak, îro li Îranê berdewam îdamê birêve dibin. Xortên Kurdan yê 18-20 salî têne bidarvekirin. Lê ev nûçe di medyayên dinyayê de zêde cih nagirin.

Li vê derê de dibe ku bandoreke Kurdan ya girîng hebe. Kurdên bakûrî, rojavayî, başûrî, ev kiryarên dewleta Îranê li dijî Kurdan ji bo raya giştî ya dinyayê dibe eşkere bikin. Ji bo vê dikarin hewl bidin.

Ji bo vê jî divê Kurd nakokiyên di navbeyna xwe de kêm bikin, van nakokiyan di nava xwe de çareser bikin, û hêzeke hevbeş pêk bînin, vê hêzê hem li dijî desthilatdariya Îranê, hem jî li dijî desthilatdariyên Tirkiyê, Sûriye û Îraqê bikar bînin.

Bi saya vê hêzê dikarin kiryarên desthilatdariya rejîma Îranê li ber raya giştî ya dinyayê eşkere bikin. Hingê Îran nikare hinde bi rehetî Kurdan îdam bike.

Pirs: Gelo bi baweriya te rejîma Îranê reformê hildigre? Yan em bêjin pirsa kurd di çarçoveya vê rejîmê de wê bê çareserkirin?

Bersiv: Carê dewleta Îranê li dijî Kurdan siyaseteke tund birêve dibe. Di salên 1930î de, kuştina Simko, di serdema Komara Kurdistan de, li Mahabadê di salên 1945-46an de îdamkirina Qazî Mihemed, û rêveberên din yên Kurd, û di sala 1989an de şehîdkirina Qasimlo û hevalên wî, û di sala 1992an de şehîdkirina Sadiq Şerefkendî û hevalên wî.

Wateya wê çiye? Wateya vê ev e ku serok û rêberên Kurdan tu yek ji wan bi emrê xwedê nemirine, bi kuştar, bi terorê hatine kuştin.

Rêveberiyeke tund e li beramberî Kurdan. Ji ber vê ye divêt ku ronakbîrên Kurd îdeolojiya resmî ya Îranê rexne bikin, ev girîng e.

Dîsa divê Kurdên beşên din yên Kurdistanê siyaseta Îranê rexne bikin û kiryarên wê li ber çavê raya giştî ya dinyayê eşkere bikin. Di vî warî de karkirina wan girîng e. Dema ev hate kirin, dewleta Îranê hinde bi rehetî nikare van kiryaran birêve bibe.

Pirs: Te basa Qazî Mihemmed û Dr. Qasimlo û Dr. Sadiq kir, gelo wan sê rêberan çawa dibînî?

Bersiv: Rêberên Kurdan şexsiyetên giranbûha ne. Di sala 1947an de Qazî Mihemed di mehkemeyên Îranê de ev tişte got; "Wek Tirkan, Ereban û Farisan, mafê Kurdan jî heye ku dewleta xwe ava bikin. Mafê Kurdan heye ku xwe bi xwe birêvebibin. Hûn niha me îdam jî bikin, ji niha û pêve jî Kurd dê ji bo vê têkoşîna xwe berdewam bikin." Ev gotinek gellek bi nirx e.

Dr. Ebdurahman Qasimlo ligel du hevalên xwe li Viyanayê di malekî de hatin qetilkirin. Kesên ku Dr. Qasimlo qetilkirî, ji Îranê hatibûn şandin ew kes Pasdar bûn û bi cilûbergên dîplomatîk hatibûn.

Ew pasdarên bi postên dîplomatîk hatibûn ku li gel wan meseleya otonomî yan jî çareseriya pirsgirêka Kurd gengeşe bikin, di deqîqeyên pêşiyên vê hevdîtinê de, ev bûyer diqewime.

Qasimlo û herdu hevalên wî qetil dikin û di demek gellek kurt de, ji malê derdikevin û dîsa di demekî kurt de ji Viyenê derdikevin û vedigerin Îranê.

Heta yek ji wan bikujan di dema qetilkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî de, xwe jî birîndar dike û bo demekî jî di nexweşxaneyê de maye. Lê hikûmeta Nemsayê derheqê van cînayetan de tu lêpirsîn nekirin.

Pirs: Çawa li kesatiya Dr. Qasimlo dinêrî? Şehîdbûna wî çi derbek li tevgera Kurd û Kurdên Rojhilatê xist?

Bersiv: Ez Dr. Qasimlo û Sadiq Şerefkendî zêdetir ji nivîsarên wan, ji nûçeyên rojnameyan derbarê wan de dinasim. Gorên van kesan jî li Parîsê ne. Tirba Dr. Qasimlo û du hevalên wî û yên Sadiq Şerefkendî û her sê hevalên wî li Parîsê ne. Sala borî em çûn Parîsê, me serdana gorên wan jî kir.

Mirovên gellek hêja û rêberên jêhatî bûn. Dr. Qasimlo endamê Partiya Demokrata Kurdistana Îranê bû, di heman demê de mamosteyê zanîngehê bû û aborînas bû. Ji pirtûkên wî dizanim ku kesayetiyekî jêhatî bû.

Rêberên Kurdan Qazî Mihemed, Qasimlo, Sadiq Şerefkendî hemû jî kesên hêja bûn. Kesek ji wan bi mirinek normal neçûn. Hemû jî bi teror û kuştinê çûn.

Pirs: Çareseriya Pirsa Kurd di çi de dibînî?

Bersiv: Divê wisa bifikirin. Pirsgirêka Kurd li Rojhilata Navîn ne wekî ya Felistîniyan e. Helbet pirsgirêka Felîstinê jî heye. Lê pirsgirêka Kurd û Kurdistan ne wekî pirsgirêka Filîstîn e.

Çima? Dijminekî Felîstînê heye, ew jî Îsraîl e. Lê li dijî Îsraîlê dijminên din jî hene, ew jî hemû dewletên Ereb in. 22 dewletên Ereb bi awayekî dijminê Îsraîl ne. Yan jî 57 welatên Îslamî ku endamên Konseya Îslamê ne, ew jî neyarên Îsraîlê ne.

Pirsgirêka Kurd weha nîne. Derdorên Kurdistanê bi neyarên wê hatine dorpêçkirin.

Wek cehnemekê ye Kurdistan. Ev neyarên Kurdistanê dixwazin te bifetisînin, ji nav bibin. Di van şertan de çareseriya pirsgirêka Kurd gellek zehmet dibe.

Bo nimûne, Felîstînî bi tenê li gel Îsraîlê rûbirû dibin û li gel Îsraîlê rûdine û pirsgirêka xwe wisa çareser dike. Dema tu Kurd bî, bi tenê ligel Bexdayê bicivî, hevdîtin bikî, pirsgirêk çareser nabe, ji ber ku li gel wê Enqere heye, Tehran heye û Şam heye.

Dewlemendiyên Kurdistanê yên xwezayî hene, Rûsiya di nav de heye, van demên dawî Dewletên Yekbûyî ên Amerîka heye. Rewşekî weha çareseriyê zehmet dike.
Di pirsgirêka Kurd de zilm û zordariyê çar dewlet bi hevre dikin, ev jî Kurdan bi paş ve dibe.

Pirs: Bi baweriya te di qonaxa niha de, gerek Kurd jî weke her tevgerên din ên netewî pitir neteweperest û nasyonalîst be?

Bersiv: Kurd divê neteweperwer bin helbet. Divê ziman û çanda xwe bi şiklekî baş bêxe warê jiyanê.

Divê li welatê xwe xwedî derkeve, li Kurdistanê xwedî derkeve. Kurd divê neteweperwer bin, jiber ku ew dixwazin te ji nav bibin û tu jî li dijî wan xwe diparêzî, neteweperweriya Kurdan ev e. Lê neteweperweriya Tirkan ev nîn e.

Neteweperweriya Tirkan ya dagîrker e, zordar e, dixwaze kultur û zimanê xwe li ser te bisepîne û asîmile bike. Îran jî weha ye.

Bo nimûne, dewleta Îranê Îslamiyetê ji bo bihêzkirina neteweperweriya xwe bikar tîne. Li Îranê, Îslamiyet ji bo bihêzkirina neteweperweriya Farisan tê bikaranîn.

Li Îraqê jî Îslam ji bo bihêzkirina nasyonalîzma Ereban dihête bikaranîn. Li Tirkiyê jî wek mînak Îslam, ji bo bihêzkirin û pêşvebirina neteweperestiya Tirkan dihête bikaranîn.

Lê neteweperweriya Kurdan weha nîne. Kurd axa welatekî din dagîr nakin, ji bo asîmilekirina neteweyekî din nîne.

Di bin zordariyê de ye, di bin zilmê de ye. Li dijî vê zilm û zordariyê, ji bo ku hemû nirxên wî yên neteweyî winda nebin, divê neteweperwer bin.

Nerîna Lîderan




Barzanî:

“Bê pirsa Amerîka û Îrenê emê ref-randomê bikin”.



Merziye Efxem:

“Baskirina ji serx-webûna Kurdis-tana Îraqê, pîlana sehyonîstan e”.



Osame Noceyfî:

“Nûrî Malikî êdî bûye dîrok”.



Yosif Mihemed:

“Em dixwazin ji riya refrandomê ve, pirsa deverên veqetiyayî çareser bikin”.

Îran di Îraqê de li pey çi digere?



Selam Îsmaîlpûr



Guherînkariyên van rojan ên Îraqê, rejêma Îranê xistiye nava qofiyeke nû de. Komara Îslamî ku berî niha jî di gel kêşeyên weke gemaroyên aborî, û komeke nerizayetiyên siyasî û civakî yên tex û qatên welat, û nakokiya di gel civaka cîhanî li ser dosiyeya etomî, û giriftarbûna di qofiya şerê li gel Sûriyê de bû, niha dixwaze ku di herêmekê de ku zêdetir nêzîkî Îran ye, û rîsk û destêwerdan û vebijêrkên siyasî yên rejîmê jêhel dibe, serî bo qumareke metirsîdar bitewîne.

Hiloşîna arteşa Îraqê di herêmên Sunîakincî ên vî welatî, û parvekirina tewaw ya wê, bi ser sê herêmên Sunî, Şîe û Kurd, xewna sergirtina hêla Şîe, ya li jêr deshilata weliyê Feqîh de, ji çavê deshilatdarên Tehranê verevandiye.

Rejîma Îranê di wan dawiyane de, bi zextxistina li ser Herêma Kurdistanê, daxwazkarê vê bûye ku hêza pêşmerge li şerê Şîe û Suniyan de beşdar be, û hewil bo parastina dewleta Malikî bide, û berjewendiyên zêdexwazane yên rejîmê cîbicî bike.

Lê helwesta hişyarane ya rêberên Herêma Kurdistanê li derheq bê alîtiya di vî şerî de, giringiya parastina deskevt û berjewendiyên neteweyî, û cihgirtina deshilatdariya neteweya kurd bi ser Herêmên ji nû ve rizgarkirî yên Kurdistanê, û herwisa pêdagiriya wan li ser mafê diyarîkirina çarenûsa neteweya Kurd, dijkiryarên dijminkarane yên rejîma Îranê li derheq helwesta rêberatiya siyasî ya Herêma Kurdistanê, û mafê berheq ê neteweya Kurd li pey xwe hebû.

Her di vê rastayê de, û piştî ragehandina helwesta rêberiya Herêma Kurdistanê li derheq paşekêşenekirina pêşmerge ji herêmên ji nû ve rizgarkirî yên Kurdistanê, û birêvebirina rapirsiya serbixweyiya Kurdistanê di pêşerojê de, mohreyên hûr û gir ên rejîmê ji pêşnimêjê Îlamê ve bigre heya serokê hêza terorîstî ya Besîc, li kiryareke armancdarane û bi axavtineke tund, gef li herêma Kurdistanê xwarin.

Her di vê rastayê de, Husên Emîr Ebdullahiyan alîkarê Erebî û Afrîqayî yê Wezîrê Karê Derve yê Rejîmê, tevî ragehandina dijayetiya rejîmê li gel îhtimana serbixweyiya Kurdistanê got: “Rêberên zana ên Herêma Kurdî ya Îraqê, dilê otonimiyê nînin, û pêbend in bi yasaya bingehîn”.

Wî herwisa tevî îşarekirina bi axavtinên Binyamîn Natanyaho, serokwezîrê Îsraîlê derheq piştevaniya ji pêkanîna dewleta Kurdistanê got: “Hinek alî ku bas ji perçebûna Îraqê dikin, encamên wê nizanin”.

Hekî em van gefxwarinên dîplomatîk li rex fetwaya cîhadê ya Mekarimê Şîrazê merce’ê teqlîl yê rejîmê danên, wê demê em baştir dikarin tê bigihîjin ji berfirehî û kûrahiya hewlên hemû aliyane yên Komara Îslamiya Îranê, derheq tirsa ji dorandina yek ji herêmên cihê nifûza xwe.

Rejîma Îranê di destpêkê de, hêvîdar bû ku Amerîka ketiye nava şerekê li dijî neyarên Malikî. Lê piştî vê ku Amerîka her şêwe kiryareke leşkerî li dijî DAÎŞ girêdayî bi lihevkirina Malikî di gel tevgerên siyasî yên Kurd û Sunî û Şîe, bo pêkanîna dewleteke giştgîr da zanîn, Xamineyî bi ragehandina vê ku: “Em li dijî her cure destêwerdaneke Amerîkayê ne”, nîşan da ku ji niha şûnde, dib ew û hevalbendên wê, di herêmê de, dest bi kar bin, û li ser piştevaniya leşkeriya Amerîkayê hisabê nekin.

Bombebarana çend xalên Sunîakinciyan di nav xaka Îraqê de, ji aliyê balafirên rejîma Sûriyê ve, nîşaneyeke ji hemen kiryara seranên hikûmetên hevalbend ên Tehranê, bo guherîna Îraqê bi Sûriyeyek din in.

Rejîma Îranê serbarê dijberiya di

Dom R: 7

Rojnameya Agirî derheq sedemên serhildana bûyerên vê dawiyê ên Îraqê, ku di piraktîk de Îraq bi ser sê beşên Şîe û Sune û Kurd de parve kir, hevpeyvînek tevî birêz Ebdullah Hicab çavdêrê siyasî, amade kiriye û eva jî deqa hevpeyvînê ye:



Ebdulla Hicab çavdêrê siyasî:

H: Arif Vêlzî

P: Birêz Ebdulla Hicab hûn rewşa niha ya Îraqê vedigerînin ser çi? Gelo rewşa niha encama çi ye

B: Rewşa ku îro Îraq tê re derbas dibe berhema çend şaşitiyên mezin yên siyasiye rêberên Îraqê bi xwe û destverdana dereke ye. Di serî de mîrateya kultûra siyasî ya ku Sedam Husên li pey xwe bi cî hiştiye pêkhateyên cuda ye Îraqê kiriye dijminê hevûdin. Piştî tevçûna rêjîma Sedam, li ciyê ku deselatdarên nû, pîvanên demokratîk bikin bingeh ji bo avakirina sîstemek nû ya siyasî, li ser şopa heman kultûra siyasî dest avêtin tolhildan û tesfiyekirina kes û aliyên ku ji wan nebûn an weke wan nedifikirîn. Sîstema nû rê neda pêşveçûna demokrasiyê û pîvanên olî kire bingeha birêvebirina welat. Di çarçoveyên siyasî, leşkerî û abûrî de deselat kete destê kom û grûpên şîe û li dijî pêkhateya sunne ya welat hate bikar anîn.

Serbarê wan zêdegaviyên deselatdarên nû yên şîe, detverdana Îranê û zêdexwaziya Komara Îslamî jî bû heger ku netifaqiyên di nava komên sunne û şîeyan de xurttir bibe. Siyaseta Amerîka jî li Îraqê bi ser neket. Amerîkayê her li destpêkê ve, rê da zêdegaviyên Malikî û alîgirên deselata ku li ser bingeha baweriya şîe dixwest Îraqê îdare bike. Ew yek bû heger ku piraniay civaka sune li Îraqê xwe li derveyî bazneya deselatê bihesibîne.

Di wê navê de rewşa Kurdistanê hinekê cuda bû û niha jî cuda ye. Her ji destpêka deselatdariya nû ya Îraqê re, kurd bûne pire di navbera kom û aliyên dijber de.

> “Li gor dîtina min, serkirdayetiya siyasî ya kurd li Başûrê Kurdistanê heya niha pir jîrane bi rewşa niha ya Îraqê re danûstandin kiriye”.

Lê keda kurdan tu encam neda, ji ber kû bingeha pêkve jiyana şîe û sunne yan li Îraqê, bi zêdegaviyên olî ji her du aliyan ve, bi taybet ji aliyê pêkhateya şîe li Îraqê ve hatibû hilweşandin.

P: Bi baweriya we pêşeroja Îraqê wê ber bi kuderê ve her?

B: Îraq çarçoveyeke siyasî ya destsaz e ku ji dema veqetiyan ji imperatoiya Osmanî li sala 1922 heya serxwebûn ji Birîtaniya ya Mezin li sala 1932 koloniya Ingilistanê bû. Piştî re kete pêvajoya avakirinek nû ya siyasî ku tê de serketî nebû. Ji dema serxwebûnê ve heya kûdita ya Beisiyan di sala 1968ê de Îraq di nava bahoza derbasbûn ji qonaxa ber bi dewletbûnê de bû. Di wê demê de ne têkiliyên navbera pêkhateyên civakî hin qas zêde bû heya netifaqî serî hildin, ne jî pêwîstî bi cîguhertina xelkê hebû.

Hilweşandina sîstema paşayetiyê ku li sala 1932 heya kûditaya sala 1958 ku rêjîm derbasî sîstema komariyê kir li ser kar bû, encama derbasbûn ji bo qonaxa nûjenbûna civaka bû. Lê dema ku partiya Beis li sala 1968ê hate ser kar, rewş zêde guherî. Di serî de gelê kurd û pişt re jî şîe ketin ber xezeba deselatdaran û hatin bindest kirin. Di rastiyê de kurd û şîe li derveyî deselatê man. Dema rêjîma Sedam hate hilweşandin, siya dîktatoriyê li ser serê Kurdistanê nema. Lê di navenda Îraqê de dîktatoriyê bi tenê reng guherî.

Li ciyê dîktatoriya partiya Beis, wê carê hêzên şîe sîstemek dîktator damezirandin ku kete tolhildan û bindestkirina civaka sunne. Wê rewşê cudahiya di navbera pêkhateyên Îraqa destsaz de hê zêdetir kir. Lewma Îraq niha ber bi ji hevbelavbûnê ve diçe û zehmete ku dubare Bexda bibe tenê navenda deselatdarî û biryardanê.

P: Helwêsta Kurd di vê rewşê de çawa dinirxînî, û di pêşerojê de gerek Kurd çawa tev bigere? Gelo ragehandina serbixweyî ya Kurdistanê ku di rojeva siyaseta Rojhilata Navîn û cîhanê de ye, bi baweriya te, wê bê encamdan?

B: Li gor dîtina min, serkirdayetiya siyasî ya kurd li Başûrê Kurdistanê heya niha pir jîrane bi rewşa niha ya Îraqê re danustandin kiriye. Niha dewleta Îraqê nikare li ser riya diyarîkirina çarenûsa gelê kurd li Başûrê Kurdistanê bibe asteng, lê ez bawerim rewşa Başûr pitir bi pêşketinên giştiye siyasî li heremê re girêdaiye. Niha bingeha siyasî, abûrî û civakî ji bo avakirina dewleta kurdî li başûr, ji her demê pitir amade ye. Di warê leşkerî de jî şiyana gelê kurd ji her demê pitir e.

Dimîne rewşa navneteweyî. Di aloziya ku niha hatiye pêş de, pêwîst nake gelê kurd bikeve nava biryarek bi lez de ku dubare dijminên xwe li dijî xwe bi hev re bike yek. Ya giring ewe ku di nava xwe de ew amadekariyên ku ji bo bi dewletbûnê pêwîstin berdewam bikin, yêkitiya neteweyî bê xurt kirin, bi dewletên xwedî deselat, bi taybet bi Amerîka, welatên Ewropî û Turkiyê re têkiliyan xurt bike, dîplomasiyek xurt di asta cîhanî de bide meşandin û ji her tiştî giringtir, xwe ji fen û xap û ji belaya Îranê bi dûr bigre. Ji ber ku niha astengiya herî mezin li ser riya azadî, demokrasî û aramiya heremê û aliyê ku pitir dijî mafê gelê kurde Îran e. Di dawiyê de pêwîste rapirsiyek li Kurdistanê bê kirin û sazî û dezgehên navneteweyî bêne ser wê qenaetê ku ji îradeya gelê kurd re rêzê bigrin.

Niha kes nikare gelê kurd bi hindê tawanbar bike ku ji aloziya li heremê re bûye alîkar. Berovajî, kurdan bi hemû hêza xwe ve hewl dane ku ji çareseriyê re alîkar bin. Binêrin, di dema herî kirîtîk de û di rewşekê de ku tevgera kurd li Bakûrê kurdistanê pir bi hêsanî dikarî livûtevgera xwe ya çekdarî xurt bike, kurdan riya aştî û çareseriya aştiyane girte pêş. Li rojava, dema ku şerê qewmî û olî destpê kir, kurdan heremê xwe parastin û neketin nava leystoka siyasî. Li Başûr, di demên hesas de, gelê kurd di navbera aliyên dijber de bû navbeynkar, ked da, alîkarî da û ji mafê xwe çavpoşî kir, tenê ji bo ku rewş aloz nebe, lê di dawiyê de aliyên Îraqî bi xwe berbûne canê hev.

Di demekê de ku deselata xwemalî ya kurd dikarî bi hêza çekan deverên dagîrkiriye Kurdistanê rizgar bike, hêza pêşmerge xwe tev li wî karî nekir heya ku rewş aloz nebe. Lê pişt re leşkerê Îraqê, dêla xwe daxiste nav lingên xwe û pêxwas û serqot tenê bi rewa xwe re gehîşt. Tenê wê demê bû ku kurd ji bo ku xelkê sivîl li hember çeteyan biparêzin, ketin wê beşa welatê xwe ku heya dema dawiyê di bin dagîrkeriya Îraqê de bû.

P: Destên dereke heya çi qas di pêkanîna rewşa niha ya Îraqê xwedî bandor bûye û herweha berdewamiya wan destan wê çi bînin sere Îraqê?

B: Eger em şaşitiyên deselatdarên Îraqê bi xwe danên palê, Komara Îslamî tavanbarê sereke ye. Pişt re jî dewletên dine cîran. Niha Îraq û Sûriye bûne meydana pêşbirkêya leşkerî û şerê hêjêmoniyê di navbera du cemserên nû yên îdeolojîk ku Îran serokatiya cemsera şîe dike û Erebistan li pişt hêzên sunne sekiniye.

Ev rewş pir bi metirsî ye û ne dûre ku xerîteya herêmê û parsenga hêzan ji bingeha xwe re biguhere. Niha qedera Îraq û Sûriyê bi hev re girêdaiye. Ne dûre ku di demek ne zêde dûr de, piyê hin welat û deverên din jî bikeve nava wê aloziyê. Ji xwe rewşek weke şerek mezine herêmî hatiyê pêş.

Di wî şerî de wê hem qurbanî hebin û hem jî aliyên serketî. Ji xwe qurbaniya ku zerera wê herî kêm be guhertina sînûran û hilweşîna çarçoveyên îroyîn li Îraq û Sûriyê ye. Lê nîgeraniya min ewe ku encama wê aloziya hê mezintir bibe û bûyerên ku nayên çaverê kirin bêne pêş.



Roja cîhanî ya piştevanî ji goriyên îşkencê

Dara Natiq



Rêxistina Neteweyên Yekgirtî bi awayek fermî, di sala 1997'an de, bi merema nehêlana îşkence û tewahiya curên riftarên tundûtûj û dije mirovî, roja 26'ê heyva Hezîranê weke roja cîhanî a nehêlana îşkence û piştevanî ji goriyên îşkencê ragehand û, her li gorî madeya yekemîn a vê konwansyonê, her cure îşkenceyek bi merema îfade wergirtin û wergirtina zaniyariyan li kesê destbiserkirî qedexe hate ragehandin. Serbarê vê pêngavê jî, heya niha diyardeya îşkencê bi awayên hovane weke beşek ji sîstema dadwerî a gellek welatan ku yek ji wan welatê dîktator û dije mirovî a Komara Îslamî ya Îranê ye, her birêve diçe.

Li gorî rapora rêxisrtina lêbûrîna nawnetewî, di zêdetir ji 111 welatên cîhanê de bi awayek sîstimatî îşkence berdewam e û di vê navberê de jî, Îran di pileya yekemî de ye û heya niha jî nêzîk 50 welatên cîhanê bitaybet welatê Îranê konwansyona cîhanî a nehêlana îşkencê û piştevanî ji goriyên îşkencê, vaju nekiriye.

Di girtîgehên Îranê de wergirtina îfadê bi zorî û bi neçarî ji rêya îşkence û lêdana bi qemçiyan, ragirtina di silûlên tarî û takekesî de, îşkenceya cesteyî û derûnî, destdrêjiyên cinsî û birrîna endamên leşê mirov li ser bingeha bi gotinên wan olê Îslamê, ji wan îşkenceyan in ku rojane kesên destbiserkirî û bi taybetî girtiyên siyasî tevî wan berbirû ne.

Herweha rejîma Komara Îslamî îşkenceyên weke gef xwarin bi destdrêjiyên cinsî û desteserkirina endamê malbatê, belavkirina fayla dengê hevjînên girtiyan di odeyên lêkolînê de, birêvebirina şanoya îdamê ku bi îşkenceya Sipîtên naskirin, bi awayek berdewam bi armanca wergirtina îfade û wergirtina zaniyariyan li girtiyan mifahê werdigire.

Bê goman riftarên weha ên dezgehên serkutker ên rejîmê, tenanet piştî serbestberdana kesê girtî jî, bandorên nerênî li ser derûna wî kesî û malbata wî bicih dihêle û hejmarek nesaxiyên dirêj mide bi dû xwe re tîne. Ji aliyek din ve em rojane şahidê bireveçûna hukmê bidarvekirin û kevirbaran û birrîna endamên leşên xortên welatê xwe ne ku rejîm bi hêncetên curbicur û bi merema tirsandina xelk û civakê û herweha, tepeserkirina her cure dengek nerazî di Îranê de birêve dibe.

Di rastî de rejîma binav Îslamî ya Îranê her di despêkê de û bi fermana Xûmeynî, di pêxema parastina deshilata xwe a dîktatorane, siyaseta îşkence û bidarvekirinê weke yek ji bingehên sereke ên deshilata xwe diyarî kir û di dehsalên 60'an de bi dehan hizar ji xelkê bêtawan bi awayek herî hovane hatin îşkencekirin û bi hezaran kes jî bikom hatin bidarvekirin û ferman cîhad a li dijî Kurdan hat birêve çûn û siyaset han heya niha jî hêj berdewam e.

Her li gorî rapora rêxistina mafên mirovan, Îran niha di pileya yekemîn a rêzbenda wan welatan de ye ku îşkenceyên hovane û dirêjmideh birêve dibe.



Karesata kîmyabarana bajarê Serdeştê

Îdrîs Sitwet



Dîroka gelê Kurd tijî ye ji ewraz û nişîw û karesatên mezin, yek ji wan karesatan kîmyabarana bajarê Serdeştê ye. Ew kîmyabaran ku di encama şerê malwêranker a di navbera Îran û Îraqê de pêk hat û bi sedema vê yekê ku Kurdistan cihek sitratejîk a di navbera her du welatan de bû, xelkê Kurdistanê ji her du parên " Rojhelat û Başûr" bûne goriyê siyasetên şerxwazane ên her du aliyan û gellek zirarên mezin bi xwe ve dîtin.

Bajarê Serdeştê ku ser bi parêzgeha Urmiyê ye, di roja 7ê pûşpera sala 1366'an(1987) de, ji aliyê hêzên esmanî ên Îraqê bi bombeyên kimyayî ên gaza "Xerdel" ve hat bombebaran kirin û bi vî awayî xemek mezin û giran xistin dilê xelkê Kurdistanê.

Di encama vê bombebarana dije mirovî de, 500 kes ji xelkê sivîl ên vê devere bûne goriyê siyaseta dujminkaraneya her du welatan û canê xwe jidest dan û herweha 8000 hezar kes jî birîndar ketin û niha jî bi destê şûnwarên xirap ên vê bombebaranê ve dinalînin.

Niha jî bandora çeka kîmyayî li ser dever û akinciyên deverê her xûya dike û roj bi rojê serhejmêriya goriyên wê çekê zêdetir dibin.

Serbarê vê zilm û rojreşiya ku anîn serê xelkê Serdeşt û derdorên vê, Komara Îslamî her di despêkê de xincî bê deshelat nîşandan û pêde hilgotinê xelkê, tu kar û xizmetek bo xelkê bajarê Serdeştê encam neda û heya niha jî serbarê hebûna 8000 hezar berketiyên kîmyabaranê , tenê 1400 kes ji wan weke kêmendam hatîne neskirin û para din ku ji 6 hezar û 600 kesan pêk tê, hêj xwediyl tu poyênekê nînin û bigre tevî gellek pirsgirêkên micid ên malî û dermanî jî berbirû ne.

Niha piştî derbazbûna 27 sal bi ser vê bûyerê de, xelkê vê bajarê niha jî çavnihêriya çêkirina nexweşxaneyekê serdemiyane dikin da ku edî bona derman û çareseriyê, emrê mayî bi neçarî di rêya hatin û çûyîna nexweşxaneyên bajarên din derbaz nekin.

Yad û bîranîna vê karesatê hertim di bîra me kurdan de ye, û em hêviya çêbûnê bo berketiyên vê bûyerê dixwazin.

Doma R: 5

gel hebûn û pêşkevtina hikûmeta Herêma Kurdistanê, bi awayeî stratejîk jî li dijî berhevbûna Suniyn di pêkhateya deshilata Îraqê, û yan jî pêkanîna herêma xwebirêvebir ya Erebên Sunî ye, jiber ku nifûza vê girûpê di dewleta Îraqê de, û yan jî pêkanîna herêmekê bo wan, bi wateya valahiya li yekparçeyiya coxrafiyayî û hêla Şîe, ji Îranê heya Îraq û Sûriye û Lubnanê, û heya qeraxa behra Medîtrane dibe.

Lewra rejîm hewil dide bo razîkirina hikûmeta Kurdistanê, yan beşek ji tevgerên Kurd bo piştevaniya ji Malikî. Lê Kurdên Herêma Kurdistanê ku bi tundî ji Malikî bi taybetî derheq Kerkûkê, budce û xwedîtî û şandina derve ya petrolê ne razî ne, êdî amade nînin nirx ji bo mana Malikî û dewleta Îraqê bidin.

Di rewşekê de ku hinek ji raportan bas ji hizûra leşkeriya Îranê di raqê de, û heya kuştina hêzên rejîmê di Îraqê de dikin, doma vê hizûrê, bi tayetî ku heke di gel çiraya kesk ya Amerîkayê re berbirû bibe, wê bibe sedema bihêzbûna kêşe û nakokiyên mesebî û wê gellek Suniyan li her dereke cîhanê bikêşe nava şerê Îraqê de.

Herwis hêzeke zêdetir dide Şîeyên tundrew ên weke Muqteda Sedr û ên weke wî.

Herwisa pêkhateya leşkerî û siyasî ya pêşeroja Îraqê, zêdetir vê bi rejîma şerxwaz ya Îranê girêdayî bike, û ew zengeke metirsîdar ji bo pêşeroja Îraqê û herêmê û Amerîkayê ye.





H: Arif Vêlzî

Se’dûn Şerîfî û hevalên wî ên pêşmerge

Se’dûn Şerîfî kurê Rehman Sala 1967’an(1346) li gundê wuştepe ya ser bi bajarê Bokanê di malbatek cotkar de tê dinê.

Se’dûn Şerîfî nasyariya xwe tevê PDKÎ weha tîne ziman û dibêje: “Di dema serhildana şoreşa gelên Îranê de, ez mijûlî xwendinê bûm, tev part û aliyên siyasî civîn û xirvebûnên cur bi cur lidar dixistin û gengeşeya siyaset û birûrayên xwe dikirin, Kurdistan jî di destê hêza pêşmerge de bû.

Wî çaxî bi hizr û lêkdaneweya xwe û herweha bi sedema pitir netewîbûna siyaset û dakokîkirina herî zêde ji mafên gelê Kurd, min PDKÎ bona bicih anîna erkê xwe ê netewî û xebatê hilbijart û ez bûm alîgirê wê partiyê”:

Se’dûn Şerîfî piştre tevlîbûna xw bi refên pêşmergên PDKÎ weha dide zanîn: “Sala 1980’an (1359) ez çûm bajarê Bokanê û min xwe bi Yekîtiya Lawên Demokrat a PDKÎ nasand û bi fermî bûm endam.

Pîştî derbazbûna salekê ez ji aliyê PDKÎ ve di hêza 110 a Beyanê de hatim sazimandan û bi awayek fermî ez bûm pêşmergê PDKÎ”.

Se’dûn Şerîfî roja herî xweş a jiyana pêşmergatiya xwe weha tine ziman: “Bohara sala 1986’an(1365) di sazmandehiya nû a partiyê de, hêza Beyan hat binkeya Deftera Diyasî li Gewredê yê. Dr. Qasimlo hat û tevî Dr. Sadiq û endamên din ên rêberiya partiyê civînek bo kadr û pêşmergên hêza Beyan pêk anî. Dr.Qasimlo û piştre jî ez kesên herî dawiyê bûn ku em ber bi hola civînê ve diçûn.

Berî lidarxistina civînê Mikrofon û cihê rûniştina Dr. Qasimlo û endamên Komîtê û fermandeyên hêzê û endamên din ên rêberiya partiyê di beşa serve a holê hatibû amadekirin.

Gellek gotin ku Kak Dr. Qasimlo gerek cenabê te here û ji aliyê serî rûnîşe, lê Dr. Qasimlo di bersiva xwe de got, Hûn xwînê didin, hûn destanrêsiya diafrînin, hûn cangorîtiyan dikin û ez bi we re Dr. Qasimlo me, lewra aliyê serî hertim cihê we ye û, pişt re bi xwe li kêleka deriyê hatine jorê de rûnişt û civîna xwe lidar xist.

Eva roja herî xweş a jiyana pêşmergatiya min e, jiber ku tu caran ji bîra min de dernakeve ku Dr. Qasimlo çi qas mirovek xakî û xelkî bû”.

Se’dûn Şerîfî di hember de roja herî nexweş a jiyana xwe weha tine ziman: “Şehîdketina Dr.Qasimlo û Dr. Sadiq û hewalên min di çeperên şer de, rojên herî nexweş ên jiyana min pêk tînin, lê roja pir nexweş ku tucaran ji bîra min naçe ev e ku, sala 1988’an(1367) ez di girtîgeha Urmiyê de di hebsê de bûm, rojekê rojnameya Kêyhan a ser bi Komara Îslamî di girtîgehê de belav kirin. Di rojnameyê de nûçeyek danibûn ku têde nivîsandibûn PDKÎ hat hiloşandin û bidawî hat, jiber ku taqimek jê veqetiyane û refên xwe ji rêbaza partiyê cuda kirine.

Em jî bê deshilat bûn û me nedikarî bi tu awayekî zaniyariyan li ser rastî û dirustiya vê nûçeyê wergirin. Ewa roja herî nexweş a jiyana min e, jiber ku tev girtî bitaybet girtiyên Kurd ên ser bi PDKÎ, tenanet ewên ku ber bi cihê bidarvekirinê dibirin, pir aciz bûn”.

Se’dûn Şerîfî sala 1986’an(1365) di dema encamdana memoriyeta partiyê li bajarê Bokanê û di gundê xwe de ji aliyê hêzên Komara Îslamî ve bi dîl tê girtin û serpêhatiya xwe weha ji xwendewanên Agiriyê re bas dike: “Di Havîna sala 1986’an de tevî şehîd Mensûr Heqpûr û hewalek din bona cîbicîkirina erkê hizbî, em ber bi bajarê bokanê ve çûn û piştî çend rojan, demjimêr 12’ê nîvro bi sedema îxaneta hindek xelkê deverê, em hatin dorpêçkirin û piştî demjimêrek şer û berxwedana tund, gulleyên me bi dawî hatin û em hatin desteserkirin.

Mixabin piştî sê salan Mensûr Hepûr hate îdamkirin û ez jî bi 10 sal hebsê hatim cezakirin. Piştî derbazkirina sê sal ji hukmê xwe ketim ber lêborînê û serbest hatim berdan.

Piştî derketin ji girtîgehê min peywendî bi gellek kadr û pêşmergên devera xwe ve girt lê mixabin dihatin şehîdketin.


Lê bi awayek fermî cardin di sala 2000’an de ez hatim Koyê û min peywendî bi refên rêxistina nepenî a PDKÎ ve girt.

Ji wê rojê pêve xebat û tekoşîna min berdewam ma heya sala 2002’an û di encama eşkerebûna tîmek ji pêşmergên partiyê li bajarê Bokanê, ez jî eşkere bûm û li ser daxwaza partiyê ez hatim kurdistana Başûr û cardin tevî refên kadr û pêşmergên partiyê bûm”.

Se’dûn Şerîfî derheq jiyana xwe ya hevpar dibêje: “Sala 1995’an(1373) ji rêya hewalekê ve pêşniyara zewicîna tevî Sara Resûlnijad keça Mihemed û xelkê gundê Paş Bilax a ser bi bajarê Bokanê bi min re hat kirin û piştî yekem hevdîtina di navbera min û hevjîna min de, me biryara zewicînê da û me jiyana hevpar awa kir. Berhema jiyana me jî keç û kurek e”.

Se’dûn Şerîfî bi vê hêviyê dawiyê bi hevpeyvîna xwe tevî Agiriyê tîne: “ Çavnihêriya min ji PDKÎ tenê yekrêzî û tebahiya refên partiyê ye û herweha hêviya min ji serkevtin û vegeriyana PDKÎ ye bo nava xelkê xwe”.

Se’dûn Şerîfî sala 1986’an(1365) di dema encamdana me’moriyeteke PDKÎ li bajarê Bokanê û di gundê xwe de ji aliyê hêzên Komara Îslamî ve bi dîl tê girtin





Roja cîhanî ya Bêwejinan û awriyek kurt

Rûnak Fethî



Rêxistina Neteweyên Yekgirtî roja 23'ê Juni(2'ê Pûşperê) a hemû salekê weke roja cîhanî ya bêwejinan diyarî kiriye. Yek ji wan texên jinan ku bi awayek berdewam maf û azadiyên wan ên bingehîn di civakên curbicur û bitaybetî civakên ku kêmtir pêşkevtî û di halê pêşkevtin dene tên binpêkirin, mafên jinan e.

Her li vê dîtingehê ve rêxistina "NY" bi merema dawî anîn bi vê rewşa dijwar û, nehêlana binpêkirina berdevam a mafên mirovîn ên bêwejinan, roja han diyarî kiriye da ku ji vê rêyê ve, asta piştevanî û alîkariyên nawnetewî di rasteya nehêlana pêşêlkariyên maf û serbestiyên bêwejinan,zêdetir bike.

Li gorî rapora "NY" di welatên di halê geşekirinê de û yan jî kêmtir geşekirî de, maf û azadiyên tu tex û qatek din bi qasê texa jinan nahê binpêkirin.

Di vê raporê de ku rewşa 25 salên borî ên jinan li xwe digire, pêdagirî li ser ducarîbûna binpêkariyên mafên mirovî ên bêwejinan hatiye kirin. Diyare amarên eşkere derheq rewşa nebaş a bêwejinan di welatên di halê geşekirinê de, bi sedema nebûna zanyariyên dirust û cihê baweriyê, cardin rewşa nebaş ya bêwejinan du hemberî xirabtir dike.

Lê di welatên pêşkevtî de zaniyariyên hûr derbarê temen, rêjeya bêwejinan û bi giştî rewşa jiyana wan ji hemû aliyekê ve heye.

Lewra rêxistina NY berbirûbûna tevî ferqûcudahiyên mafên bêwejinan di welatên di halê pêşkevtinê de weke ewleviyeta yekem liber çav digire.

Bi sedema ferqûcudahiyên civakî, kolturî û siyasî, dîtingeha civakên curbicur derheq jinan bi giştî û bêwejinan bi taybetî ciyawaz e. Di civakên ku sîstemek demokratîk hatiye binyatnan, takên civakê bê ferq û cudahî ji aliyê deshilat û yasayê ve, mafên wan hatine parastin û tiştek bi navê binpêkirina mafên bêwejinan, têde cihê heyrîman ê ye, jiber ku di sîstemên weha de her takekî mafê diyarîkirin û hilbijartina adaz heye derheq çawaniya diyarîkirina jiyana xwe û, xwediyê xweseriya biryardanê ye.

Bêwejin di van welatan de di pêvajoya pêşkevtin û geşekirina civakê de, di hemû astên curbicur de xwediyê bandora xwe ya taybet in.

Lê em dibînin ku beravajî welatê demokratîk, welatên ku sîstema dashilatdariya wan liser bingeha ol û îdeolojiya req û nedemokratîk e, bitaybetî welatên rojhilata navîn, netenê dîtingehek sunetî û parvemayî li hember mafên bêwejinan hene, belkî maf û azadiyên hemû takên civakê tên binpêkirin.

Di wan civakan de jin weke takek azad û xweser di mafê diyarîkirin û hilbijartina şewaza jiyana xwe bi tewahî xweser nînin, bitaybetî bêwejin tewî gellek asteng û pirsgirêkên civakî, kulturî, aborî û yasayî berbirû dibin.

Mafên wan dibine goriyên dab û nerîtên parvemayî ên civakî. Hekî bi her sedemekê dawî bi jiyana hevpar a jinekê bê, vêca çi sedem jin be û yan jî sedem mêr be, jin ji aliyê civakê ve bi çavek nerênî lê tê nêrîn û berdewam dikeve ber tan û teşerên derdora xwe.

Eva di demekê de ye ku tenê dîtingeha kulturî û parvemayî ya civakê niye ku mafên bêwejinan binpê dike, belkî bêwejin bi sedema nebûna derfetên kar û aboriyek xweser, jiyana xwe bi destengê û hejariyî derbaz dike, bitaybetî jinên ku hevjînê xwe jidest didin, neçar in ku zarokên xwe di rewşek nebaş de perwerde bikin û weke amrazek bona peydakirina nanê rojê, karê bi zarokên xwe bidin kirin.

Li gorî serhejmêriya sala 2013'an ku ji aliyê sekreterê rêxistina NY û sindûqa pere ya ser bi vê rêxistinê ve hat ragehandin, nêzîk bi 115 milyon bêwejin di hejariyê de jiyana xwe derbaz dikin û herweha 81 milyon bêwejin bi destê destdirêjî û azarên cismî ve dinalînin.

Eva cuda ji vê yekê ye ku bêwejin di welatên şerlêdayî de, goriyên sereke ên şer, destdrêjiyên cinsî, bidîl girtin, aware bûn û jinavbirinê ne. Tenê ev yek maye ku em bêjin, serbarê ve ku rêxistina NY, roja bêwejinan bi merema jinavbireina hemû wan bê edaletiyên civakî û pêşêlkariyên ku derheq bi vê texa civakê tê kirin diyarî kiriye, Lê hej binpêkirin û perawêz xistina maf û azadiyên bêwejinan, her berdewam e û bi tewahî ji aliyê civakan ve nehatiye qebûlkirin.

Wî çaxî bi giştî maf û xwastekên jinan di civakekê de tê dabinkirin ku, weke mirovekî rêz ji kesatî û kerameta wê bê girtin û derfetek azad û wekhev ji wan re bê dayîn û, di vê peywendiyê de asta hoşyarî û rewşenbîriya civakê û herweha nemana eqliyeta mêrsalariyê tevî hebûna yasayek dadperwer û yeksanşxwaz, dikare cihê ferqûcudahiyên xirab bide mirovsalarî, azadî û serbestiya hemû takên civakê.





Pirsa jinan di Îranê de û çend gotinek

Hîwa Mîrzayî

Piştî qedexekirina beşdariya jinan di lîga cîhanî a topa destan(Walîball) de, di berwara 3'ê (24.06.2014) Cozerdanê û di dema lîztoka di navbera Îran û Birazîlê de, cardin jinûve pirsa beşdariya jinan di sitadyomên werzşî de derket rojevê û bû cihê bas û nîqaşên zaf di Îranê de û bû cihê nerazîbûna jin û mêrên Îranî û her di vê pêxemê de tevgera jinan di Îranê de bi çêkirina kempêunekê piştevaniya xwe bona beşdariya jinan di sitadyomên werzşî de nîşan da û, di hember de jî ev nerazîbûn û xwastekên xelkê, bûye sedema helwêstgrtina beşek berçev ji binav nûnerên jin li parlemêntoya Îranê.

Fatime Aliya Nûnerê Tehranê li parlemêntoyê, piştî nerazîbûnên jinan got: "Karê jinan zarok bûn û perwerdekirina zarok û pêragihîştin bi hevjînên wan e, ne dîtina lîztokên werşî". Herweha Sekîne Omranî nûnerê Xumêynê jî gotiye ku: "tu hewce nine ku jin herin sitadyomên werzşî û hekî gellek alîgirê dîtina kêberkêyên werzşî ne, bila li mal û ji rêya TV yê lê binêrin". Her di vê derbarê de Lalê Êftixarî gotiye ku : " Hindek kes dixwazan bi wan basan arîşe û kêşeyan çê bikin".

Neyêrê Êxwanî Bêteref a nûnerê Îsfehanê jî vê pirsê dixe stûyê dujminên Komara Îslamî û dibêje: "Rê nedana jinan bo stadyomên werzişî karek ne girîng e, lê hindek kes dixwazin vê pirsê biken amrazek bona dijatiya tevî nizamê".

Pirsa çûyîna jinan bo nava stadyomên werzşî, her di despêka hatineserkara rejîma Komara Îslamî ve, yek ji daxwazên jinan bûye û bi yek ji mafên xwe dane zanîn û, di gengeşeyên hilbijartinan de berbijêrên hilbijartinê, bitaybetî hilbijartinên serkomariyê soza cîbicîkirina vê daxwazê û bi dehan daxwazên din ên siyasî û civakî bi jinan re didin û, piştî bidawîhatina hilbijartinan û serkevtnê, piştê ji sozên xwe dikin û di encam de eva jin e ku dibe dorandiyê despêkî ê wan gengeşeyan û mafên wan her weke berê ji aliyê karbidestên Komara Îslamî ve tên binpêkirin.



Îdolojiya siyaseta deshilatdarên Komara Îslamî ya Îranê, di cixza mêrserdestiya hişik û sedsalên navîên de birêve diçe û, eva jî bûye sedem ku jin di Îranê de ji mafên xwe ên herî despêkê bêpar bin û bêpariya han jî hem li malbat, hem li civak û hem jî di birêveberiya welat û beşdariya jinan di karûbarên siyasî û welatdariyê de, bi tundî reng vedide.

Li gorî yasaya bingehîn a Îranê, jin di Îranê de tevî tundûtujiyên herî hovane berbirû dibin û beşek zaf ji bûdceya welat bona xebat li dijî "Bê hicabî" ya jinan tê mezaxtin û, hêzên Êntzamî di cihê vê de tevî gendeliyan berbirû bin û hewla çêkirina rewşek baş û tenah bo xelkê xwe bin, liser cade û kolanan wan jinan destbiser dikin ku kinc û mîkyac û riftarên wan serdemiyane ne.

Pirsa han çûye parlemêntoya Îranê û her di vê derheqê de roja Duşemî 24.06.2014 Ebdulriza Rehmanî Fezlî wezîrê dewleta Ruhanî bo parlemêntoyê hate gazîkirin û leser diyardeya "Poşîna saport û goreyên dirêj" tevî pirsyarên nûnerên parlemêntoyê berbnirû bû. Navbirî di dema bersivdanê de îşaret bi çend amaran kir ku cihê hûrbînî û heyrîmanê ye.

Wezîrê dewletê bas ji vê yekê kir ku heya niha 22o hezar kes ji aliyê hêzên Întizamî ve hatine desteserkirin û herweha bas ji vê yekê kir ku di sê heyvên derbazbûyî de, hêzên Întizamî hoşdarî dane 18,787 kesan û herweha 8629 jin jî hatine desteserkirin û soza vê yekê ji wan hatiye sitandin ku kincên xwe biguherînin herweha 45 kes jî bo dadgehê hatine şandin û hişdarî bi 3770 hezar xwedî taksiyan hatiye dayîn û herweha bas ji vê yekê jî kir ku dewlet bona berbirûbûn tevî bê hicabiyê bûdceyek 20 milyard Tûmenî terxan kiriye.

Bilindbûna rêjeya tawan û gendeliyên madî ên karbidestên Komara Îslamî û herweha zêdebûna rêjeya telaq û têkilî bi madeyên hişber ji aliyekê û, rewşa lewaz ya aborî û tenê mana Îranê di civaka cîhanî de bi sedema siysetên şaş, ew pirsin ku gerek di parlemêntê de bikewin ber bas û niqaşê û rêya çareseriyê ji wan re bê peydakirin û hokarên pêkhatina vê rewşê nehêlin, lê weke em dibînin karê vê nawendê bûye ev ka gelo jin çi dipoşin û çawa riftarê dikin û, eva jî bûye sedema vê yekê ku roj bi roj baweriya xelkê Îranê li hember karbidestên rejîmê kêmtir bibe û, xelik bi giştî û bitaybet jin bi awayek xweser hewla bidestve anîna mafên xwe ên binpêkirî bidin.

Gotinên Navdaran

A: Firat Cewerî



Huner çiqas dirêje Xwedêyo,jiyan çiqasî kin e.

Goethe

Tu hunermendên mezin,tu tiştên derûdora xwe mîna ku heye nabînin,ger wan wilo bidîtana,ew nedibûn hunermend.

O.Wilde

Huner ne nanê jiyanê, şeraba wê ye.

JeanPaulRichter

Ger dinya vekirî û rohnî bûya,huner çê nedibû.

AlbertCamus

Ew nemir, veqetiya; hunermend namirin ku.

Longfellow

Huner, xwezayek e, ku ji aliyê mirovan ve hatiye holê.

OwenMerith





Tiştonek



A: Mahir Berwarî

-Çume mala mîr, pisyar dikim ji mirovêt pîr, kê dîtiye teyrê bi şîr.
-Ji tiştan ne ti tişt e, nikil weke xişt e, perasû li nav pişt e.
-Tiştûne serê tiştuy xiştûne, pilek lêda kuştûne, pîre gayê zirçûne.

1. Pêşî

-Reşe û sure ne bizn e, serma dipeçe ne jin e.
-Reşe wekî qîrr, difire wekî tîr, kutilka çêdike, wekî jina pîr.

2. Kêz

-Li vê derê dibe rêz, li wê derê dibe fêz.
mêriya bi darên mazî ve.

3. Gêrik

- Sih`ir hêsk, beden nasik, 4 gûçkê bê pêçik.
- Yê keje wekî keşk, yê mite wekî mişk, biharan tere, payizan hişk.

4. Şeytanok

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye


Xwendevanên hêja!

Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi rêya E-maila Agiri2003@gmail.com ji me re bişînin.

AGIRÎ

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (232)

Çend dîmenên rêûresma 22'ê Pûşperê di bajarê Silêmaniyê de



Birêz Mihemed Nezîf Qadirî di dema axaftina ji bo beşdaran li ser salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo



Kora muzîkê ya PDKÎ di dema xwendina sirûdên şoreşgerî taybet bi salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo





Rawestana li ser piyan ya beşdarên rêûresmê di dema xwendina sirûda neteweyî ya Ey Reqîb de



